Ax ji derdê
vî zemanî

Ax ji derdê vî zemanî
Ez dûr kirim ji koma bira
Li min xayin, pê nizanî
Jîna min kir ser agira
Roj bo rojê xerabtirim
Çenku xaniyê min bê dera
Gelî bira ji were dibêjim
Hûn jî rabin, hilkin çira
....
Dûrketin gelek girane
Jîna xerîbî bê kare
Roj bi hesab di borînim
Û şevê stêra l min hevale
Welatê min! nizam çawa
Min tu hêlayî, jibo neyara
Tuyi cihê hemî Xasa
Û Lalişê û Extiyara
...
Peyman li min ez bimînim
L ser van soza û qirara
Ez rabikim erdê şirîn
Û xudan bikim hemî dara
Wek zemanê bab û kala
Alê rakim bê pirsiyare
Da bilindkim navê mezin
Êzîdxanê li hemî wara

Qûlo Xwedêda Qûlo

Tirên buhurî

Tirên bi lez buhurî
min li ser qerexê çavnerîna tirêneke
ku buhurîbû dikir
û rêwî belav bûn bal rojêd xwe...
û ez hê çavnerînê dikim
kemançe ji dûr ve digirîn,
ewrek min ji derdorê xwe hildigre.
Bêrîkirina tiştên ne xuya
Dûrket û nêzîk dibû
Ne ji bîrkirin min dûr dixe
Û nejî bîranîn min nêzîkî
jinekê dike.
Ger hîvek hingiviyê
Bang kir: “Ez hîvim”.
Tirên bi lez buhurî
Dema min li ser qerexê ne bi min re bû
Demhijmêr guherî
Da demhijmêr çende?
Çi rojê xeyd ket nav duh û sibê
Gava qereçiyan barkir.
Ez li vira çêbûm û nebûm
Dêmek ev tirên wê zayinde min bengîn bike
Û wê dar li dor min bi meşin.
Ez li vir bûm û nebûm
Ezê di evê tirênê de bi ser ahenga
Xwe yê ku tije bibû ji dû peravê çemekî
Ku di navbera herduwande mir
Weke ku xort bimre vebim
“Xweziya xort kevir bûya”
Tirên bi lez buhurî
Di min buhurî û ez
Mîna îştegehekê, nizanim
Xatir dixwazim yan pêşwaziya xelkê dikim
Ahlen, li ser pîrêkêd min
Çayxane
Nivîsgeh,
gul,
telefon,
û hoç
û mşzîk
û rêzbend a
helbestvanekî dîtir ku wê bê û çavnerînê bike
tirên bi lez buhurî
di min buhurî û ez
hê çavnerînê dikim.

Helbest: Mehmûd Derwîş
Wergêran: A. Mûsa

Heta kengî ?

Heta kengî....
dê hosa bîn?
Nîv sax û nîv mirî,
û heta kengî...
dê nesaxên
rewan e bîn?
Û kengî dê ji dil birrîn
of û nalîn?
Kengê çav jî
wê ji xew rabîn?
Û ji dil û hênav
rondik barîn
Û....
kengî evîna me
dê rojê bîne..?
Heta kengî dê li diniya yê
.....tert û bela bîn
Heta kengî, û heta kengî....heta kengî?
.....
Ji me nayê, ji xeynî gazî...
û deng û qîrîn.

Sundus Salim Al-Necar

Oxir

Bi kûde di çî ?
min ne hêle!
min ne hêle
di şeveka xewmaş û razayî de,
di pêlên deryak har
avjenekî reswe
bê çar.
Min ne hêle
û
min ne soje bi agirê oxira xwe
bila tim û tim
lêvên min
mexelêd ramîsanê te bin.
MIN NE .....HÊLE

Babê Lawîn